Di wê demê de endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Dûran Kalkan jî Hikûmeta Başûr hişyar kiribû.

Her wiha Fermandarê Biryargeha Navendî ya HPG'ê Murad Karaylan amaje bi yekîtiya neteweyî kiribû û gotibû: "Madem dijminên gelê Kurdistanê bûne yek, divê gelên Kurdistanê jî bibine yek û li ber xwe bidin..". Bê guman hişyariyên fermandarên me yên Kurd di cih de bûn. Ji ber ku eger yekîtiyeke neteweyî hebûya, ev felaket bi ser me de nedihat..

Li aliyê din jî, Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî dest bi têkiliyan kir..

Yekem seredana wî ji Si'ûdiyê re bû, paşê çû Îran û Tirkiyê, herî dawiyê jî çû Fransayê.

Gelên Rojavayê Kurdistanê di nava civatên xwe de gotin:

Binerin Ebadî çû cem şahê Si'ûdiyê û jê re dibêje biner divê em li Kurdan bibin yek..Kurd dixwazin her 22 dewletên me, ji me bistînin..!

Gelek caran jî gotibû ku Kurdistan li herêmê, tê wateya Îsrayîla 2'yemîn.

Beriya van qas gotinan, Serokê Herêma Kurdistanê birêz Mes'ûd Barzanî seredana Erebistana Si'ûdî kiribû..

Li vir Şahê Erebistana Si'ûdî tekezî li ser serxwebûna Kurdistanê kiribû..

Lê piştî seredana Ebadî, ev sînaryo û daxuyaniyên dûrî rastiyê, li dij Referandomê sekinîn.

Piştî ku gelê Kurdistanê çû ser sindoqan û dengê xwe da, van dewletên navborî mîna peymana Lozanê biryar da ku eger Kurd bixwazin bibin xwedî dewlet, divê destpêkê li ser termên me bimeşin...

Ambargo û çember bi her awayî li derdora Kurdistanê bûne weke xelekekê.

Herî dawî, di 16'ê Cotmehê de mîlîsên Heşda Şabê bi fermana Îranê derbasî nava Kerkûkê bûn û xwestin şerê Kurd û Ereban ji nû ve vejîn bikin.

Lê Kurdên ku dikarîbûn bi salan şer bikin(Em ji bîr nekin ku Gerîla û Pêşmergeyên qehreman li wê derê bûn û dikarîbûn wekî her carê ji bo mafên xwe şer bikin), xwestin ku bi rêyên dîplomatîk rê li pêşiya vî Şerê Cîhanî yê 3'êyem ê di navbera Kurd û Ereban de, bigirin.

Paşê di 29'ê Cotmehê de Serokê Herêma Kurdistanê Mes'ûd Barzanî ji erkê xwe îstîfa kir.

Ev îstîfa, şoqek di nava gelê Kurd de çêkir.

Hin rastî heta niha nehatine zelalkirin ka ji bo çi Mes'ûd Barzanî îstîfa kir.

Gelo dewletên mezin jê re gotine îstîfa bike..?

Yan wî îstîfa kiriye?

An jî ji bo ku şerê Kurd û Ereban rûnede, îstîfa kiriye ?

Hîn jî ev pirs di meraqa gelê Kurd de ye..

Bê guman em behsa van rûdanan dikin, lê dîsanê em vedigerin perspektîfên Rêberê Gelê Kurd Ebdullah Ocelan û 5 prensîpên wî yên ji bo lidarxistina Yekîtiya Neteweyî.

Her 5 prensîpên ku rê li pêşiya dubarebûna sînaryoya Başûrê Kurdistanê li Rojhilat, Rojava û Bakurê Kurdistanê, digirin.

Çaresiriya herî guncaw ji birînên gelê Kurd re, YEKÎTIYA NETEWEYÎ YE...

Mirina Tebayî…Ji Jîna Bi Tenahî Birûmetir e

Biha'edî Şakir

Piştî 16'ê Cotmehê ku bajarê kerkûkê ji aliyê Heşda Şabî û artêşa Iraqî ve hat dagîrkirin; êdî ji gelê Kurd re baş zelal bû ka li ser astên navdewletî, herêmî û navxweyî, kî dost e û kî dijmin e.

Her wiha careke din hat xuyakirin, bê çendî yekrêziya hêzên siyasî û daneheva mala Kurdî girîng e; ji beriya ku derfeta sedsala 21'ê ji dest me here.

Bêdengiya Amerîka û welatên rojavayî der barê dagîrkirina bajarê kerkûkê bi çekên Amerîkî û di bin serperştiya her dû efserên Îranî "Qasim Suleymanî" û "Iqbal Bûr" de, bi tenê weteyek e wê heye: Ew jî diyar dike ku ta kîjan radeyê nerînên van welatan der barê pêşeroja Iraqê de şaş in, ji ber ku bûyera kerkûkê bi tenê dikeve di berjewendiyên rêjîma îranî de, û Iraqê bi temamî radestî wê dike.

Li aliyê din; ji ber ku Kurdan bi tenê referandomeke nepabend bi serxwebûnê li dar xistibû, û tu serxwebûn ji aliyekê tenê ve ranegihandibû.

Wisa helwesta van welatên Hevpeymana Navdewletî der barê referandomê de li dij pîvanên mafên mirovan û di heman demê de li dij pîvanên civakên wan, dihat.

Li ser asta herêmî em dikarin bi kurtayî bibêjin ku: " Rî dibe bost, lê dijmin nabe dost".

Lê tiştê herî balkêş di helwest û kiryarên van welatên herêmî der barê referandoma Herêma Kurdistanê de ew bû, wan ne tenê dixwest ku di pêşî de û ji beriya ku referandom li dar bikeve wê rawestînin û pûç bikin.

Lê belê ewan dixwest ku hêvî û xewna serxwebûnê ya ku ji beriya sed salî ve di dil û mejiyê Kurdan de mezin bûye, û bi lidarxistina referandomê di wijdanê nifşên nûhatî de li seranserî Kurdistanê geş dibû; ewan dixwest ku wê hêvî û xewnê vemirînin, da ku careke din neyê vejîn.

Lê ya herî girîng ji bo gelê me, şikestina li ser asta navxweyî bû; bi sedema ku Kurdan nikarîbû nakokiyên xwe yên dehên salan li pişt xwe bihêlin û çareser bikin, da ku rê nedin dijminê xwe ku destêwerdanê di nava wan de bike.

Ezmûna Kerkûkê ne tenê ji bo Başûrê Kurdistanê mînak e, lê li Rojavayê Kurdistanê jî gerek e ev ezmûne li ber çavan bimîne û sûd jê were wergirtin.

Mixabin ta roja îroj, hêzên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê hîn li gor wê rewşa ji beriya 16'ê Cotmehê tevdigerin, û wekî ku tiştek bi serê Kurdan nehatibe.

Ya ku ji hemû aliyan tê xwestin ew e ku rahêjin barê xwe yê neteweyî û bi berpirsyarî di vê qonaxê de tevbigerin…

Ji ber vê yekê eger ku hêzên Kurd ên desthilatdar (TEV-DEM) destpêşxeriyekê ji bo daneheva mala Kurdî pêşkêş nekin, û ku ev destkeftiyên Rojava têk herin, dê li pêşiya gelê xwe gunehbar bin.

Her wiha li dûv vê destpêşxeriyê, ji aliyên Kurd ên din (ENKSê û Pêşverû) tê xwestin ku bi erênî nêzîk bibin. Di heman demê de ji hemû aliyên Kurdî tê xwestin ku kêmaniyê ji hev dû bikşînin, da ku di vê dema hestyar de bigihin yek helwestê û yek projeyê.

Wisa eger ku Kurd di projeya xwe de li Rojavayê Kurdistanê bi ser bikevin, wê çaxê dê ew serkeftin ji bo her kesî be, û dê deriyê destêwerdana dijminan bi yek çarî re were girtin.

Û eger Kurd bi ser nekevin; helbet dê beyhod (zerer) kêmtir be, û milet jî li paş tevgera xwe ya siyasî di yek eniyê de bimîne.

Kurdan ji mêj de gotiye: " Mirina Tebayî…Ji Jîna Bi Tenahî Birûmetir e".

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Rojnamevan û Nivîskarê Kurd Têmûrê Xelîl: “ Kamûran Bedirxan di peyameke xwe de ji min re dibêje eger hemû Kurd wekî te bûna, niha me çar Kurdistan lêkiribûn, ne yek.”

Têmûrê Xelîl, di sala 1949’ê de li paytexta Ermenîstanê “Êrîvan” ji dêya xwe bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li dibistanên bajêr dixwîne. Paşê li zanîngehê tevlî beşên fîzîkî û matematîkî dibe û piştî 5 salan derdiçe.
Piştî ku xwendina xwe bi dawî dike, êdî bi qasî sê salan(Ji 1974’ê hetanî 1977’ê) li çiyayê Elegezê li gundên Kurdan mamostetiyê dike.
Dema ku li gundên Kurdan mamostetî dikir, carinan nivîsên xwe ji rojnameya Ria Taza re dihinartin.
Piştî demekê, êdî redaktorê rojnameyê jê dixwaze ku tevlî xebatên rojnameya Ria Taza bibe.
Ji 1977’ê hetanî 1981’ê, li rojnameya Ria Taza xebatên rojnamegerî yên cûrbicûr dike.
Ji ber têgihiştina wî ya di babetên çand û wêjeya Kurdî de, êdî di 1981’ê de Radyoya Êrîvanê daxwaznameyekê jê re dişîne, da ku tevlî karê radyoyê bibe.
Têmûrê Xelîl di pê sê salan re ji xebata di radyoya Êrîvanê de, careke din vedigere rojnameya Ria Taza û xebata xwe hetanî 91’ê didomîne.
Ji 91’ê û bi şûn de, êdî kar û xebatên Têmûrê Xelîl dikevin di çarçoveyeke berfirehtir de.
Di nêva rojname, radyo, komele û navendên girêdayî çanda Kurdî de li Moskoyê dixebite, paşê diçe Siwêdê.
Aniha li Siwêdê dimîne.
Ji bilî endametiya di çend kom û hevgirtinên Kurdî de, aniha Berpirsyarê Malpera Ria Taza ya Beşê Kurdî ye. Ji dehên salan ve ye ku berhemên Kurdzan û Rojhilatzanan ên girêdayî dîrok û çanda Kurdî, werdigerîne bo zimanê Kurdî. Her wiha berhemên Kurdî yên bi tîpên kîrîlî û tîpên abeya Erebê Şemo, vediguhêze bo tîpên abeya Mîr Celadet Bedirxan.
Jiyana Têmûrê Xelîl ê ku li tevahiya heremên Kurdan û pirî deverên cîhanê geriyaye, ji serpêhatî û bûyînên balkêş, dagirtî ye.
Di vê hevpeyvînê de hem xebata Têmûrê Xelîl, hem jî xebatên Rojnameya Ria Taza û Radyoya Êrîvanê, binasin.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

-Dema mirov li jînenîgariya te dihinêre nemaze ji hêla xwendina te ve, rastiyek diyar dibe ku xwendina te dûr ji babetên wêjeyî û rojnamegerî ye. Îcar me dixwest destpêka şopandina te ji rêyên rojnamegerî û nivîskarî re, binasin...?
Her tişt ji malê hat...
Dema ku dêya min û bavê min li radyoyê dixebitîn, li malê jî kar dikirin.
Nivîsên xwe li malê dinivîsîn û nivîskarên mezin jî yên wekî Erebê Şemo, Haciyê Cindî û gelekên din, dihatin bal me.
Îcar dema ku wan dest bi nivîsînê dikir, min jî bi çavekî li wan meyze dikir.
Êdî hêdî hêdî ez ji wan nêzîk bûm û ketim nava ewê govendê.
Wekî din jî dema em zarok bûn, eger me pirsek ji dêya xwe yan jî ji bavê xwe bi zimanê Rûsî yan jî Ermenî bikira, bersiv nedida û em neçar dikirin ku pirsa xwe bi zimanê Kurdî bikin.

Kurd negihane wê astê ku qîmetê bidin wan berheman, ên ku tiştên pir balkêş der heqê dîroka Kurdî de, vedihewînin.

-Di biwara wergerandina berhemên Kurdzanan de, xebateke te ya berçav heye. Tu ji dergehê wergerê derbasî qada nivîskariyê bûyî yan..?
Tu caran di bala min de tune bû ku ez ê pirtûkan çap bikim.
Lê çi li vira heye, gelek nivîskarên Rûsî, Ermenî, Cihû û ji yên neteweyên din jî...bi dehan sal kar û xebat di ber çand û dîroka Kurdna de kirine, pirtûk çap kirine û lêkolînên hêja kirine.
Ne tenê wiha, lê belê piraniya wan xwe hînî zimanên Farisî û Erebî kiriye, da ku bi rêya wan zimanan xizmetekê ji çanda Kurdî re bikin.
Îcar tenê Kurdên li Emrenistan, Rûsya û Gurcistanê dikarîbûn ewan berheman bixwînin, ji ber hin ji wan bi zimanên Rûsî û Ermenî ne, hin jî bi tîpên Kîrîlî ne.
Armanca min ji wergerandin û tîpveguhastina wan berheman ew e ku Kurdên tevahiya Kurdistanê karibin bixwînin.
Jixwe ev ne karê tu hikûmetan e ne jî karekî fermî ye, ez vî karî bi daxwaza dilê xwe dikim.
Tişta ecêb jî ew e ku hin Kurd ji min re dibêjin eger tu van berheman wergerînî zimanê Tirkî, em ê çap bikin ji ber ku bêhtir tên firotin.
Kurd negihane wê astê ku qîmetê bidin wan berheman, ên ku tiştên pir balkêş der heqê dîroka Kurdî de, vedihewînin.
-Her çi qas xebateke te ya dûr û dirêj di barê wêjeya Kurdî de heye jî, lê bêhtirî xwe tu bi xebata rojnamevanî têyî naskirin.
Gelo tu xwe wêjevan dihesibînî, yan jî rojnamevan?
Ez kar datînim pêşiya xwe û dikim, îcar hûn çi navî li min dikin, bikin.
Min li Moskoyê jî rojnamevanî li du cihan kiriye.
Carekî jê ez pênc salan di radyoyeke Kurdî de xebitîm.
Cara duyan jî di 2008’ê de li Moskoyê radyoyeke fermî ya Kurdî vekirin û gazî min kirin. Li wir jî alîkarî ji wan re lazim bû û ez bi qasî sal û nîvekê li wira xebitîm.
Der barê Kurd û Kurdistanê de, min di rojname û kovarên Ermenî û Rûsî de nivîsiye.
Lê piraniya nivîsên min di rojname û kovarên Kurdî bûne.
Min karekî din jî da pêşiya xwe û min bi ser xist. Ew pirtûkên ku ji sala 30’î ve û hetanî niha li Ermenîstanê bi Kurdiya tîpên kîrîlî çap bûne, min bi alîkariya her du keçên xwe, tevahiya wan veguhastin bo tîpên latînî.
Ji bilî van karan, ji sala 1930’î hetanî sala 1937’ê, çend berhem bi latîniya Kurdên Sovyetê(Abeya Erebê Şemo) çap bûbûn, min ew jî veguhastin bo tîpên latîniya Kovara Hawarê û aniha çendek ji wan çap bûne.

Ji 120 rojnameyên ku li Sovyetê derdiketin, Ria Taza yek ji 4 rojnameyên herî serkeftî bû li ser asta Sovyetê.

-Wekî malbata Xelîlê Çaçan, xebateke wê ya bêhempa di Radyoya Êrîvanê û Rojnameya Ria Teze de heye. Eger tu bi kurtebirî li ser dîroka avabûna van herdu dezgehan biaxivî...
Ria Taza di 1930’î de derketiye. Di hefteyê de du hejmar jê derdiketin, anku mehane 8 hetanî 9 hejmar derdiketin. Wê çaxê bi piştgîriya Moskoyê derdiket. Plana Moskoyê ew bû ku bi rêya van rojnameyan piştgîriya kêmneteweyan bike.
Ji 120 rojnameyên ku li Sovyetê derdiketin, Ria Taza yek ji 4 rojnameyên herî serkeftî bû li ser asta Sovyetê.
Wiha dom kir hetanî salên 90’an. Radyo di sala 1955’ê de vebû, lê tenê wekî test bû.
Du kesan lê kar dikir, yek jê dêya min bû.
Moskoyê di 1957’ê de xwest ku wê radyoyê bike fermî, îcar bavê min ji Elegezê anî û ew kir redaktorê ewê radyoyê.
Û bavê min hetanî 1981’ê li wir ma.
Ew qas sitran û tiyatro li radyoyê hatin tomarkirin. Lê di destpêkê de gelek zehmetî dihatin dîtin, ji ber ku di sitranên me de jinrevandin, mêrkuştin, tolhildan û gelek tiştên wiha hebûn; îcar Moskoyê jî destûra tomarkirina evan sitranan nedida.
Bi Moskoyê re danûstandin çêbûn, û ji Moskoyê hat xwestin ku ev çand û kultûra me ya dewlemend, divê winda nebe.
Ew radyo tenê ne Êrîvanê bû, lê belê bi Moskoyê ve girêdayî bû.
Wî çaxî jî 10 hetanî 12 kesên xwende û zana li radyoyê dixebitîn û karekî bêhempa kirin.
-Du bêjerên jin ên pêşî li nêva Kurdan hene, yek jê “Eznîfa Reşîd” e ku dayîka te ye û ya din jî “Zeyna Îbo” ye.
Hin dibêjin bêjera pêşîn “Eznîv” e, hin jî dibêjin “Zeyn” e.Tu çi dibêjî..?
Hin kesan nivîsiye ku salên 30’î radyo hebûye; lê tiştekî wisa tune bû.
Eger radyo hebûye jî, tenê li Êrîvanê hatiye guhdarîkirin û negihaye gundewaran, ji ber ku weşana wê gelekî lawaz bû.
Wê radyoyê tenê du-sê hefteyan kar kiriye û paşê gotine ku bi ser neketiye.
Hema bibêje ku weşana wê tenê di çarçoveya du kîlomitreyan de bû.
Îcar tu agahî û arşîvên wê radyoya ku dibêjin Zeyn lê xebitiye, tune ye, ji vê yekê tiştekî piştrast tune.

Weqfa Îsmayîl Beşîkcî pirtûkek li ser dîroka Radyoya Êrîvanê çap kiriye ku ji serî hetanî binî tiştekî rast tê de tune.

-Piştî derketina pirtûka Zerî Înanç ya bi navê “Di Radyoya Êrîvanê de Dengê Kurdî”, der barê agahiyên li ser xebatên Xelîlê Çaçan û malbata Celîlan di Radyoya Êrîvanê de, dubendiyek derket holê.
Hin kes dibêjin ku Têmûrê Xelîl xebata malbata Celîlan sivik dinirxîne û dijayetiya wan dike. Tu çawa van gotinan dinirxînî?
Min nedixwest di ortê de vê pirsê vekim, lê ji ber ku te pirsî ez ê bersiv bidim.
Weqfa Îsmayîl Beşîkcî pirtûkek li ser dîroka Radyoya Êrîvanê çap kiriye ku ji serî hetanî binî tiştekî rast tê de tune.
Tu pirtûkê vedikî, di pela pêşîn de wêneyê Casimê Celîl e û di nava pirtûkê de jî hemî resm û wêneyên malbata wî ne; xwedêgiravî wan radyo çêkiriye û bi rê ve biriye.
Lê rastî çi ye, di sala 55’ê de ew radyo têstî bû. Dêya min û Casimê Celîl tê de kar dikir. Dema ku ji Moskoyê komîteyek hat û lê nihêrî, dît ku Casimê Celîl di nava du salan de hîç karek nekiriye, karê ku kiriye jî, ne karekî tam e.

Di 55’ê de dema ku Kerepêtê Xaço hatiye radyoyê da ku sitranên xwe tomar bike, Casimê Celîl bera wî daye.

Yek ji nimûneyan ew e ku di 55ê de dema ku Kerepêtê Xaço hatiye radyoyê da ku sitranên xwe tomar bike, Casimê Celîl bera wî daye.
Dema ku komîteya Moskoyê Casimê Celîl ji kar diavêje û bavê min dike serok, bavê min dibêje ez nahêlim ku Casim bêkar bimîne û bila her li bal min kar bike.
4 beşên radyoyê hebûn(Beşên edebiyat, çand, karûbarên partiyê û malhebûna gundîtiyê) ku bi nivîsînê ve girêdayî bûn û bavê min nedikarî ewan beşan bidiyê, ji ber ku Casimê Celîl nedizanî binivîse.
Îcar bavê min beşa sitranan dayê û gotê divê tu dengbêjan bînî, li wan birênî û li radyoyê sitranan ji wan re tomar bikî.
Casimê Celîl 6 salan li ber destê Xelîlê Çaçan xebitiye, û pirtûkek aniha çap bûye ku hemî karên radyoyê dike ji para Casimê Celîl..!
Ew pirtûk behsa xebata Celîlê Celîl û Zîna Celîl a di radyoyê de dike, ev herdu kes tenê yek se’etê di radoyê de nexebitîne.
Piştî ku Casimê Celîl ji radyoyê derdikeve, keça wî Cemîla Celîl tê beşa sitranbêjiyê û dikeve şûna bavê xwe, ew jî bi serokatiya bavê min.
Her kes dizane ku bavê min 24 salan û dêya min 27 salan di radyoyê de kar kiriye, ya xwe

jî nabêjim ku min 4 salan kar kiriye; evê kitêbê qet behsa vê xebatê nekiriye.
Danûstandina Moskoyê bi qasî 24 salan bi awayekî raserast, bi bavê min re bû.
Ez texmîn dikim ku ev pirtûk an bi nezanî, an jî bi zanebûn hatiye çapkirin da ku radyoya me reş bike.
Kitêb çawa hatiye nivîsîn, Zerî Înanç bi Celîl re rûndine û Celîl jî ji serî heta binî derew lê kiriye. Aniha çend nivîskar hene xwe dane ber nivîsîna pirtûkekê ku tê de dê rastiya dîroka radyoyê diyar bikin û di demeke nêzîk de derdikeve.

Min du hevpeyvîn bi Cegerxwîn re kirin, yek jê se’et û nîvek e, ya din jî 40 deqe ye.

-Di sala 1982’yê de, te di yek rojê de du hevpeyvîn kirin. Yek bi Seydayê Cegerxwîn re, ya din jî bi Pro.Qenatê Kurdo re. Eger tu bîrdanka xwe tev bidî û ji me re serpêhatiya herdu hevpeyvînan bibêjî...
Herdu hevpeyvîn min di yek rojê de kirin, ji ber ku Cegerxwîn çûbû bal Qenatê Kurdo li Lênîngradê.
Qenatê Kurdo telefonî min kir û gote min ancex tu li vira karibî rastî Cegerxwîn werî. Wê hingê min kurê Cegerxwîn “Azad” jî nas dikir, li Moskoyê wî jî ji min re got ku Cegerxwîn hatiye.
Min du hevpeyvîn bi Cegerxwîn re kirin, yek jê se’et û nîvek e, ya din jî 40 deqe ye.
Bi Qenatê Kurdo re jî bi qasî 40 deqeyan min hevpeyvîn kir.
Wê demê hin pirsgirêk û alozî jî li ser hevpeyvîna min a bi Cegerxwîn re çêbûn, ji ber hin Kurdên hesûd digotin ku Cegerxwîn ne Kurdê Sovyetê ye û nabe em propogendayê jê re bikin.
Ji bilî vê yekê jî, wê demê Ordîxanê Celîl jî hebû û li bal Qenatê Kurdo kar dikir. Qenat jê re gotibû ma ji ber çi tu jî bi Cegerxwîn re hevpeyvînê nakî, gotibû “Ez bi biyaniyan re nakim”.
Ez bi serê xwe ji Êrîvanê çûm Lênîngradê û min 5 hezar km derbas kirin, da ku hevpeyvînê bi Cegerxwîn re bikim. Ji ber min dizanî ku mirovên wiha tiberk in. Kirina van herdu hevpeyvînan wekî deynekî di stûyê min de bû. Kesên ku dixwazin ji bo van herdu hevpeyvînan pesnê min bidin, dibêjim bila ew “wan kesan rexne bikin, ên ku wê demê ji dest wan dihat û nedikirin”.
-Di navbera te û Kamûran Bedirxan de hinartina peyaman hebû, we her duyan ji hev re peyam dihinartin. Te û Kamûran çi ji hev dixwest û we çi ji hev re digot?
Min bi rêya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Kamûran Bedirxan nas kir. Wê hingê Mîr Kamûran pirsa pirtûkekê kir, îcar min gelek pirtûk jê re hinartin. Wî jî bi rêya peyamekê bersiv da û min jî bersiv da...bi vî awayî me çend peyam ji hev re şandin.
Kamûran Bedirxan di peyameke xwe de ji min re dibêje eger hemû Kurd wekî te bûna, niha me çar Kurdistan lêkiribûn, ne yek.
Ez dizanim ku Kamûran Bedirxan ji bo her Kurdekî girêdayî çand û zimanê xwe, wiha kiriye û ew handêr kiriye.

Ji beriya 30 salan ez hatim Rojavayê Kurdistanê û min çend xortên zana dîtin, yek ji wan Konê Reş bû, yek jî Dildarê Mîdî bû.

-Tevgera wêjeyî ya Kurdên Rojavayê Kurdistanê ji serdema Hawarê ve û hetanî roja îroj, tu çawa dinirxînî?
Jixwe Hawar, Hawara we ye û nivîskarên wê li Sûrî bûn.
Eger ez hinekî dûrî mijarê herim, Kurdewarî û welatparêziya herî mezin li ser asta her çar parçeyan, min li Rojava dîtiye.
Hetanî bi siyasetmedarên Kurdistanê yên parçeyê din jî dema ku bazdayî bûne, li Kurdên Rojava bûne mêvan û baş qedrê wan hatiye girtin.
Şerê ku aniha li Rojava dibe jî, şerekî mêrane ye. Şerkerên aniha li Rojava şer dikin, zarokên welatparêzan in. Ewan ciwanan dixwest malên xwe biparêzin, xaka xwe biparêzin û parastin.
Lê wisa çêbûye ku êdî çek û hêz zora aqil dibe.
Ji beriya 30 salan ez hatim Rojavayê Kurdistanê û min çend xortên zana dîtin, yek ji wan Konê Reş bû, yek jî Dildarê Mîdî bû.
Bi daxwaza min çend camêr bi min re hatin û em çûn Şamê bal Apo Osman Sebrî. Lê mixabin min nekarî hevpeyvînê pê re bikim.
-Di dawî de, tu ji civata rojnamevan û rewnakbîrên Kurd re, çi dibêjî?
Ez jî wekî we hemiyan im.
Bingeha Hawar û Roja Nû ji bal we bû.
Kurdên herî zana jî yên wekî Cegerxwîn û Zaza ji nava we derketine. Eger Kurdewariyek bi min û te re hebe, ji xwîna wan derbasî damarên me bûye.
Em ji berhemên wan fêrî Kurdewariyê bûn.
Sipasiya we dikim...

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

GAZINC

Min tu çare ji bilî reva ji gilî û gazincên vê civakê nedidît, û ji bilî aliyekî ku ez pê de herim; tu warê min jî nema.
Ew alî jî, aliyê qulbe bû.

Cîhan Hesen

Wê rojê wekî gelek car, roj û kêliyan; min xwe bi tenê hest kir. Li derdora xwe nihêrîm, ew jî ji min re nebûn bersiv.
Belkî ew jî weke min bûbûn, êdî nema bi xwe, bi jiyan, bi kêfxweşî , bi êş û bi evînê hîs dikin.
Wisa wê rojê jî hat bîra min ku divê hinekî xwe rihet bikim, dûrî mirov û qelebalixa jiyanê bikevim…
Ez çûm kur û neçûm kur, gazinc û gilî nediqediyan; hinekan behsa nên dikir û digot ku: Em êdî newêrin nên bixwin, ditirsin kevir û qilçik tê de hebin. Weke her roj nan nayê xwarin.
Hinekan behsa mazotê dikir, û digot: Zarokên me ji serman re cemidîn û mazota komîna me hîna nehatiye.
Hinekan behsa muçeyan dikir û digotin: Ew muçeyên ku rêveberî dide me, têra me û tedbîrên jiyana me nake..
Her aliyekî behsa kêmasiyên jiyana xwe dikir, dibe ku mafê wan be; lê wê rojê min tu maf ji tu gazincan re nedît, ji ber ku êdî ji gazincên zêde nema min dikarî tehmûl û guhdar bikira.
Min tu çare ji bilî reva ji gilî û gazincên vê civakê nedidît, û ji bilî aliyekî ku ez pê de herim; tu warê min jî nema.
Ew alî jî, aliyê qulbe bû.
Jixwe baraneke pir xweşik dibariya, wisa hemî bîranînên lihevhatî û xweş dianîn bîra min. Ez di wan bîranînan de meşiyam, bêyî ku hîs bikim , hew min dît, dengvedanek hate ber guhên min, wê dengvedanê bi pistepisteke pir delalî deng dida û digot: Em ê kengî Kurdistana Azad bibînin..?
Hew wan tenê gazincên Azadiyê dikirin, û tenê Xweda lome dikir ku ew bi axa pîroz re zû kirin yek…
Dixwestin ku bi temamî Kurdistanê Azad bikin û piştre miradê vê pîrozbahiyê di wê kêliyê de pêk bînin.
Li wir, wan tenê dilê min şad kir û ew tenêtî ji bîra min bir , min li wir xwe aram û kêfxweş hîs kir .
Erê, hew min dît ez gihiştim goristana Şehîd Dijle û wan tenê xweş gazinc dikirin, ew jî Gazinca Azadiyê bû.

DIYARDEYA DIJAYETIYÊ

Keko Osman

Di baweriya min de ev diyardeya neyênî (Dijayetî) taybetmendiya tevger û civaka Rojhialata Navîn bi giştî ye, girdayî kevneperestî û ezezîtiyê ye ji aliyekî ve; aliyekî din ve girêdayî berjewendî û partîtiyê ye, hem jî girêdayî çand û perwerdeyeke oldarî yî çewt e.
Her wiha ji bandora peyrewîtiya partiyên Rojavayê Kurdistanê ji partiyên Kurdistanî yên sereke yên parçên Kurdistanê yên dîtir re, ye.
Lewra partiya ku ji 57'ê ve ava bûbe, xwe dibîne binemaya damezrandina partî û Kurdayetiyê û ji xwe pê ve napejirîne.. ev jî yek ji pêrsgirêkên sereke ne.
Her wiha sekreterê dêrîn peya nabe û derfetê nade yên dîtir ta gora wî neyê kolan. Di heman demê de nûjenên sergerm dixwazin gevneşopî tev were rûxandin û rêşkirin.
Îcar ev tovê diyardeya dijayetiyê diçînin û dibe gereka rûxandin û hilweşandina tevger û civakê, têkbirin û binpêkirina prensîpên wekhevî û dadmendiyê di welatan de, lewra rêyên çareserekeirin û pêşveçûnê dixitimin.
Ev diyarde di pêwendiyên siyasî de yên di nav partiyên me de li seranserî her çar parçeyên Kurdistanê bêtir zelal dibe, û bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê.
Der barê peyrewîtiya partiyên Rajavayê Kurdistanê ji partiyên Kurdistanî yên sereke re(Ên parçeyên din) û xwespartina biryar û fermanên wan partiyan de, ez ê mînakên wek sembolîk nîşan bidim:
Dema berf li Qendîlê were xwar, an baran li Hewlêrê bibare, an jî roj li Silêmaniyê vede, di heman demê de li Rojavayê Kurdistan "sobe" tê dadan, sîwan tê vegirtin, gumlikê milkurt tê wergirtin..
Û carcaran ew nakokî di nav wan partiyên sereke de vedimirin, hingî partiyên me yên Rojavayê Kurdistanê dibin dizê pêlavên xwe, mixabin. Îcar ev peyrewîtiyeke korane ye û karvedana wê "Diyardeya Dijayetiya" wan partiyên parçeyê Kurdistanî, derbasî nav partiyên Rojavayê Kurdistan dibe.
Eger em Kurd wek tevger, rêxistin, sazî û rewşenbîr li xwe venegerin û çareyekê peyda nekin; em ê nikaribin hevkariyeke siyasî li gor van qonax û derfetên dîrokî û zêrîn saz bikin û em ê xewna sedê salan ji dest xwe berdin.
Ev nayê wê wateyê ku ez bê hêvî me, berovajî vêya ez geşbîn im ku siberoj a gelê me ye, û gelê me bi partiyên xwe ve xwedî rol û bandoreke erênî ne, her wiha qadên berxwedan û têkoşeriyê li Bakur û Başûrê Kurdistanê nikarin ked û xwîna wan bidin mandelê.
Tenê dixwazim piştrast bikim ku Rojavayê Kurdistanê di qonax û derfetên awarte re derbas dibe, lewra gerek e berpirsyar li gor peywirên xwe bin, û behaneyên

Penaberê Bêrûmet

Selam Darî

Wê şevê pê de, pitpita Xanimê ji guhên wî derneket.
-Kuro Xelo: "Ya sibê tê wek vê xelkê tevî dakevî Duhokê, ji xwe re li karekî bigerî; û yana ez nema vê yekê ji te qebûl dikim".
Xelo di nava cihan de ye, deng jê nayê, ditirse biaxive û pişta xwe daye jinikê.
-Kuro te ez be'ecandim, çima tu bersiva min nadî? Tu wek gayê Xemo yî lawo!
-De raze xanimê ,ta sibê xudê mezin e.
-Bine bine ha, eger tu sibe neçî Duhokê, tu dizanî wê çi çêbibe, tu li devê min rast hatiyî, min ji te re sist kiriye tu jî pê de têyî, xuya ye bi te gelekî xweş e ku tu bêkar mayî. Ew jiyana ku li Qamişlo min bi te re bûrand, êdî nema bi wî rengî dijîm.
-Bextê min î reş ,kuro tu dibê qey çavên Xanimê li vî welatî vebûne, nema ditirse jî lawo..! Yê min kî ji min re bibêje: Ev welat li pîrekan tê ,wan dike mêr (Di dilê xwe de dibêje(.
Ji xwe re dibêje: Eger ez biaxivim, dê nav me ne xweş bibe.
-De bavo raze, bi soz sibê diçim Duhokê, û li karekî digerim.
-Ah wilo qurban, te îcar dilê min xist di cih de û dikarim xew bikim. Qurban dilê xwe ji min negire, ez dixwazim rewşa me xweş bibe, li min bibûre delalo….
Sibehê xanimê di kon de diçe û tê, teqereqa firaxan e. Taştêya Xeloyî amade dike, da ku wî bi rê bike.
-Heyrano(Bi dengekî qube), rabe taştê bixwe!
Xelo bi lez ji nava cihan rabû, berê xwe da destavê! Wey ev hinek tê de ne lawo.. Li ber xwe ket û di cihê cih de vegeriya.
-Keçê çavdêriyê li destavê bike ta ku vala bibe.
Hema dît ku cîranê wî derket ,di cih de ew çû.
-Keçê ma av heye ez dest û rûyê xwe bişom?
-Erê erê, wa di bîdonê kesk de ye.
Xelo bi lez çend gep xwarin.
-Keçê bi Xwedê pere jî bi min re nînin.
-De va ye 5000 Dînar bi xwe re bibe.
Hema Xelo pere xist di bêrîka xwe de û berê xwe da dergehê kampê.
Bi sedan kes diçin, bi sedan tên. Kamp cihê xirecireke mezin e… hin ji wan nasên Xelo ne, silavê lê dikin, silava wan bi serê lêvan vedigerîne, dilşikestî ye, dunya di çavên wî de sar bûye.
Nizane bê çawa giha dergehê kampê, dengê şufêran xweş tê: Duhok,Sihêla, Hewlêr…
Di cih de berê xwe da tirimbêla ku diçe Duhokê.
"Xuya ye kamp ne gelekî dûrî Duhokê ye, ji ber ku ez zû gihiştim bajêr.
Cara yekem e Duhokê dibînim, çi bajarê xweş lawo!
Sitrana Şivan Perwer di bîra min de tê:
Ez çûm Duhokê Duhoka rengîn
Gelek ciwan e bajarê şêrîn
Lê çi bibêjim, dilê min bi vê jîngehê xweş nabe. De ka ez ji xwe re li karekî bigerim. Li vê kolanê û li ya din dipirsim, lê çare nîne. Kesên di bazarê de hemû yek bersivê didin: Karker ji me re ne gerek in.
Kuro dikeve serê te, di vî bajarê mezin de, nikaribim karekî peyda bikim? Hêêêh, ez ê bi çi rûyî herim malê, û dê Xanim çi ji min re bibêje?"
Roj nêzîkî nîvro bûye, ew bi xwe jî westiyaye. Ji nişka ve xwe li ber dergehê xwaringehekê dît, di ser xwe re nerî û xwend: Xwaringeha Şêx Se'îd.
Gerek e xudanê vê xwaringehê welatparêz be, Xwedê ye, heye karê min li cem wî hebe. Dudilî dibe:
-Nizanim derbas bibim, derbas nebim..? Hema bi Xwedê ez ê derbas bibim.
Nav di xwe da, derbas bû û berê xwe rast da wî kesê li pişt maseyê rûniştî, ew ê cil û bergên Kurdî wergirtine. Kêsmê wî dide xuyakirin ku xudanê xwaringehê ye.
Bi dengekî nizim silav lê kir, lê mirovê li pişta maseyê bi dengekî bilind silava wî vegerand: Ser serê min amo, kerem ke.
-Dixwazim pirsekê ji te bikim?
-Xêr e
-Dixwazim kar bikim, ma karê min li cem te heye?
Dema ku bi vî zaravî axivî, xudanê xwaringehê got:
-Tu xelkê Rojava yî?
-Belê amo.
-De fermo rûne. Kuro Şêro çayekê bo mêvanê me bîne!
-Wey tu bi xêr hatî.
-Tu sax bî.
-Min gelek birinc ji penaberan re rêkir, bere xêra min be .
-Bira! Karê te li nik min heye, eger tu bixwazî şol bikî?
-Seyda! Ma tu yê rojane çi bidî min?
-15 hezar Dînarên Iraqî.
-Ma ne kêm e amo?
-Kuro bê çi hûn miletê Rojava zimanê we dirêj e, ma parsek û bi şûr qetek?
-Bes bes be…(gotina wî dibre)
-Ji te re bibêjim, berî hûn bêne vêrê, dizî li Kurdistanê nebû, piştî hûn hatin welatê me; we dest bi diziyê kir. We gelek kes kuştin. Qey çavê we li xerakirina welatê me ye?
Ev welatê ku me bi xwînê standiye, gerek e we ji vî welatî re rêz girtiba, eger ne ji me ba, dê kûçikên we li ku bireyana? Hûn bi xêra me îro penaberên pêncsitêr in.
-Seyda seyda, bêhna xwe fire… (Gotina wî dibire).
-Hûn gelekî ne baş in ta bi xêzanê we jî van mûdêlên firencî li xwe dikin, qey rûmet li nik we nîne..?
-Hey kurê……ê, tu ser pîrekê me wisa diaxivî hey bênamûs..
Û bi gotina xwe re jî kulmek avêtê. Dema ev xirecir çêbû, karkerên xwaringehê bi wan ve hatin. Hinan ji wan polîs xwestin.
Polîs di du-sê deqeyan gihiştin. Her dû bi hev re birin. Gotinên xwediyê xwaringehê standin, û ew sebest berdan. Li pepûkê Xelo zîvirîn û bi zirt bi ser de rabûn:
-Tu penaber î, divê tu bi edeb bî kuro û eger na, em ê te vegerînin cihê tu jê hatî .
Ma tu nizanî ku "Çênabe kerên guhsist, tirên şidyayî bikin?".
Û ji wê rojê de, nema Xelo dengê xwe ser Xanimê bilind kir .
Hin bi hin fêrî bêdengiyê bû.
Diruşma wî di jiyanê de hat guhertin, û her dem digot: Bêdengî jiyan e.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Xelîl Sasonî

TÎRÊN KEVANÊN EBRIWAN
Tîrên ji kevanê ebriwên te ku weşîn min
Kirne birîn ewan ji min cerg û dilê min
Tîrên te digo hatine avêtin ji destê:
Restem kurê Zal ku pê mirin cerg û hiner min
Min hêvî hebû ku tê bikî rehmê li halim…
Gava ku te bîtir kir li min derd û elem min
Ger bibme evîndar, min digo dê bibme dil şad
Gava ku mi dî tîrên b`jehir barîn dilê min
Ew jehra helahil digerî l`canim bi giran î
Pê dikujî j`min carekî sebr û hewes min
Ez mame senem j`tîrên te re her wekî armanc
Ta bûme birîndar, çûn ji min hewl û qewet min
Nizanim çi bêjim ji te re ey xusrewa rinda
Lewra te bi der daye ji min `eql û emel min
Min êdî nema bo xwe divê jînê di dinya
Ew jîna ku tev jehr û elem bî di hinav min

KURDISTANA EZ DIXWAZIM
Kurdistanek ez dixwazim tê nebin jar û feqîr
Kurdistanek ez dixwazim tê nebin paşa û mîr
Kurdistanek ez dixwazim tê nebin qet paşverû
Tajiyê dijmin ew in… her doz û daxwaze nêçîr
Gava impiryal bi êrîş tê welat wêran bikî…
Bo kevanê destê wî carek dibin ew: Jehretîr
Kurdistanek ez dixwazim tê nebin: Axa û şêx,
Nêçîrvanên ava şîlo, dûvik û rêberên kwîr
Pale û cotkar neçin ber destê axê bo gilî
Ta li wan pêk bînî carek: Çîroka rovî, penîr
Hem mirîdê rîdirêj û reben û Yezdanperes
Hew li tekyê ser nixûm bî ber nigê şêx, qîre qîr
Ger çi şêxe, ger çi axa, herdû dûvên koledar
Dijminê millet seranser, wek hev in: Pîvaz û sîr
Rojê tengahî û tirsê, li milet nabin xwedî
Lê di rojên serxwebûnê… xwe dikin xweş destegîr
Ta bi kengî pale û cotkar bi vî rengê teres
Her di bin lingê bengêra perçiqin mîna hevîr?
Karker û cotkarê kurdan… her li wan bin: Kevnekinc
Lê xwedî Dolar û Dînar… li xwe kin: Şal û herîr!
Dewlemend in, polperest in, ez bi wan nadim tucar
Dîtina yek rûyekî tîrêjê tavê kirbî: Qîr
Rêberiya milletê Kurd, hew dihêlim têkevî
Destê diz û keleş û hem xwînmij û gayên di pîr
Kurdistana ez dixwazim: Tê de partî bî serok
Lawê karker: Serkomar bî, lawê cotyar bî: Wezîr
Nahêlim sermayedar çêkin hêlînên kapîtal
Çunkî Kurdistana sosyalîste min herdem di bîr

EZ DENGÊ BIRÇIYAN IM
Hevalê pêşmergahên ku li ser lat û çiyan im
Hêstirê çavê sêwiyan, ez dengê birçiyan im
Çakûçê destê karker im, dasa destê cotyar im



Dijminê paşverû me ez, ji pêşverû re yar im
Hevalê qata jêrîn im, ji kê bî yan ji kû bî
Neyarê qata jorîn im, çi nêzîk bî çi dûr bî
Hevalê pêşmergahan ez, hevalê şoreşgêr im
Zimanê gelên bin dest im, li dengê wan guhdêr im
Ez dengê karkera me ku li London û li Parîz
Qêrîna xwendevana me li Istenbol û Tebrîz
Nabim dostê mirovên wek: Cimeyyil, Şim`ûn û Hitler
Belê dostê şehîd im ez di axa Tellizze`ter
Ez dengê milletê kurd im, şoreşgêrê kurdî me
Endamê partîzan im ez, xebatkarê Mîdî me
Bo koledaran… tucarî serê xwe natewînim
Wek Gîvara şervan im ez, hevalê Hoşîmîn im
Hevalbendê Toda me ez li Ehwaz û li Tehran
Hevalkarê Dewgênc im ez li Enqera û Tetwan
Milletperwer û çeknas im… Silvadorê Elendî
Welatparêz û mêrxas im… Xandî, Nehroyê hindî
Li Kongo wa ji millet re… ez im dengê Lomomba
Di Şîlî de Nîroda me, ez im Kastro li Kûba
Ez im dengê Kebotşî ku li ser Qudis dinalî
Ez im dengê Mekaryos ku li ser Qubris dikalî
Tîrê çavê reşikan im… di sînga sermiyan im
Dengê: Newwab û Gorkî ser zimanê taziyan im
Ez im dengê Cegerxwîn û Mehmûd Derwîş û Lorka
Ez dengê Martin Loser im di nêv reşkên Emêrka
Hevalê karkera me ez: Kîm Îl Song ê Kûrî me
Xwêdana enya cotyar im… sosyalîstê Sûrî me.

WELATO
Palevan im, şixrevan im, rojava têm bêndera
Lê belê begler dizê van şixre û dasê min in
Pêşmergah im, şoreşvan im ez li ser lat û çiya
Paşverû her rêberê dijmin li hevrazê min in
Partîzan im, xwendevan im, doz û daxwaz: Pêşveçûn
Kevnperest her dijminê van doz û daxwazê min in
Sazebend im, awazên min ser zimanê millet in
Lê çi sofî dijminê van saz û awazê min in!
Teyrê baz im, serfiraz im, her li ezmanê te me
Bejnebost her xwey şewatê: Lîs û hêlîna min in
Leşker im ez, her peywanê xak û sînorên te me
Lê belê axa: Dizê çek, tiving û dûrbîna minin
Ez fîdakar im welato, xwîna min bo te diyar
Lê belê şêx: De`wedarên kuştin û xwîna minin
Sosyalîst im, şoreşgêr im, tim dinêrim ez li dûr
Dewlemend her: Dijminê raman û nêrîna minin
Ez dengbêj im, tu şepalî, her li ser te distirêm
Ên mejî zingar: Neyarên lavij û bestê minin
Torevan im, ristevan im, her pesindarê milet
Lê xwedî şaş: Dijminê van tore û ristê min in
Karker im ez, mil ji pola, gav û dem çakûç di dest
Lê xwedî sermiyan: Dizê west û keda destê min in
Zorîkar û xwînmij in ew, dijminê: Postê min in
Lê sipas îro, Belengazên welat: Dostê min in

JIYANA MIN
Jiyana min jiyanî tu, di jînê de: Bi jîn be
Her roj tu tirhekî nû wa bide şaxê xwe, şîn be
Meger carek bixwazî tu di ristêd bibme bilbil…
Di gulzara dilê min de: Binefşek sor û şîn be
Ji bo ku ez di jînê de nema êdî bikim şîn
Gula cûrî bi ber çavim, li ber bozêm: Bi bîn be
Eger tedvê bibhîzî sazê ristim û bibînî
Arê dil xweş, divêtin tu bihîstin û bi bîn be
Tu rûfinda min î lewra wekî perwane ez têm
Disojim xwe li ber şewqa te rûfindê, bi tîn be
Çiqas tînê evîna te, du çav û hem du lêvan?
Xwezî roja bibînim ku: Tu jî wek min bi tîn be
Jiyana min: Eger sax bim… xemê te dêb revînim
De ka tu jî ji bo derdê dilê min: Xemrevîn be
Divêm sozê bidî carek: li dinyê her tu geş bî
Nebînim ez tu rû zer bî, belê sor be, bi xwîn be
Ma hêjî tu nizanî ku ceger min tevde xwîn e?
Belê kohê Ararat im… tu jî: Ceger bi xwîn be
Di hebsa Mîrê Botan de… wekî Mem dê binalim
Heta rojek bibînim ku ji bona min: Tu Zîn be
Ji bo ku şehsiwarek bim di meydana cirîdê…
Ji min re tu: Kezî, zingo, gulabend û tu zîn be
Dixwazî koh wekî Ferhad bi neynûkan bikolim?
Nebînim ku di himbêza Perwîz de tu: Şêrîn be!
Birîndarê du çavên te û destê te: Mesîh e…
Bihêvî me ku rojek dê ji bo min: Baweşîn be
Jiyana min, bi rastî jî, di jînê de…Tu: Jînî
Tu ronak be di rêka min de jîna min… tu: Jîn be
Te nîvê dil revand û bir, te ez hiştim bi nêvî
Dilê nîvco, nizanî ku dê kêm şad û evîn be?
Belê dîsa e razî me, tenê tenha tu carek
Ji nîvê mayî re: Peyxam û saz û hem evîn be
De ka carek biparêze dilê nîvco ji derdan
Ji tîrê çavê xwey kujtar, li dora wî: Kemîn be
Erê jînam dilêm dîne, divêt wî ku e dîn bim
Belê ne ez bi tenha xwe… tu jî bi min re: Dîn be
Xwezî b`roja li maristana dînan pêrgî hev bin
Di wê rojê, ji min re tu: Parêz û ol û dîn be
Ezê nêva dilê xwe wa bi endazî bikolim
Veşêrim te ji ber çavan, ji ter: War û hêlîn be
Sehergahan bi berbanga sibê re, bême ba te
Civatê em bikin têde… ji mer cî û civîn be
Bidin hev em: Du çavan û du lêvan û du sêvan
Ku her deh tevlî hev bûn tu li her dehan, bikîn be
Heçî çav ew bila şer kin, herin hevdî bi êrîş
Birînkin hev bi tîran ew, di nêv wan: Qetle xwîn be
Bila lêv, hevdî ramîsin, binoşin hev, bidoşin
Şeraba ku ji hev mêhtin… meya



Helbestvan û parêzerê Kurd Xelîl Sasonî, di sala 1944'ê de li bajarê Qamişloyê çavên xwe li jiyanê vekirine. Xelîl Sasonî xwendina xwe ya seretayî û navîn li dibistanên bajarê Qamişlo diqedîne, paşê li Zanîngeha Helebê di 1977'ê de Beşa Parêzeriyê bi dawî dike.

Malbata Xelîl Sasonî ku bi Mala Eliyê Ûnis tê naskirin, serkêşa Serhildana Sasonê bû û zêdetir ji 10 salan şerê Roma Reş (Tirkiye) kiriye. Xelîl Sasonî jî da ser şopa bavpîrên xwe, lê ewî tenê PÊNÛS wekî çek hilgirte nav tiliyên xwe û hestên xwe bi rêya xamê derbirî.

Di geşta nivîskariya xwe de, Xelîl Sasonî çar xelatên Kurdî wergirtine. Aniha berhevokeke wî ya helbestan a bi navê " ŞÎPEK JI BERFA MERETO" tê çapkirin, jê û pê ve 3 destnivîsên wî hene.

Nivîskar Xelîl Sasonî ji beriya çend salan bi Nexweşiya Penceşêrê ket û ber bi Bakurê Kurdistanê ve çû, da ku li wir bê dermankirin.
Li Bakurê Kurdistanê û di 3'yê Çileya 2017'ê de koça dawî kir û li gundê bav û kalên xwe hat veşartin.

Dema ku Xelîlê Sasonî li Şama paytext dihat dermankirin û bijîşkan jê re got ku tu ji nexweşiya penceşêrê rehet bûyî, ev helbesta jêrîn nivîsand:

PENCEŞÊR

Penceşêr te dgo: Ez şêr im, qet li dinyê naşikêm
Wey pisîko tu binêre çawa îro m' te şikand
Wek çiyayê Hîmelaya, tund û xurt im, nahejim!!
Wey reben, bahozê min rengê Sonamî, te hejand
Ez giran im, ez pêdar im, ragir im xwe, naleqim!!
Bablîsoka vîna min te kir kelemper û firand
Mifriq û pola me, hişk im, qet tucarî natewim!!
Ka binêre îro çawa min tu cût û te tewandî
Te ji min pirsî û gotî: Kansêr im, ez mêrkuj im!!
Ez: Kurê Sasûn û Xerzan, min jî bersiv bo te şand
Penceşêr, hew bêje şêr im, va ye dinya tev de dît
Min tu kir rovî û qirdik û l`nexweşxana gerand
Ber nexoşên (Karsînoma) tev bibînin vaye ku:
Heyfa Berzanî û Zaza û Nezîr mij te sitand.

Kultûrname

DEWLEMENDIYA FOLKLORA KURÎ (2)

Zeynulabidîn Zinar

Yek: Ji bo ku xelkek eger wek netewe bête pejirandin, divê ku çandeke wî xelkî jî hebe. Îcar eger ew çand çi qas dewlemend be, ew netewe jî hew qas bi koka xwe, bi azbat û nijada xwe wisa dewlemend û kevnare tê qebûlkirin.

Dido: Ji ber ku Folklora Kurdî bi çîrok û çîrovanokên xwe pir dewlemend e, tê de gelek babetên cuda cuda hene. Bi xwendina wan babetan, hicirkên mejiyê mirov pirr dişixulin û berepêş diçin. Bi wê yekê mirov xweşî û şênîtîyeke zêde dibîne.

Di Folklora Kurdî de gelek babet û şaxên cuda hene. Her yek ji wan bi serê xwe şaxekî zanistiyê ye û pir jî dewlemend e, xasma jî Gotinên Pêşiyan.

Pîvana dewlemediya Folklora Kurdî ji van hawayên li jêrê, rind eşkera bûye:

-Di berhemên folklorî de, de gelek bêjeyên cihêawe û hevoksazî hene.

-Di berhemên folklorî de, gelek meselok û serpêhatîyên dema bihurî hene

-Di berhemên folklorî de, gelek tewrên cuda hene.

-Di berhemên folklorî de, her tim tevdîra ji bo xweparastinê heye.

-Di berhemên folklorî de, ragitin û lihevrastikirina malbatî heye

-Di berhemên folklorî de, her tim serok, berpirsyar û rîspî hene.

-Di berhemên folklorî de, xasma di yên rawilan de her tim herêmeke kifş a taybetî heye.

-Di berhemên folklorî de, ji yekê zêdetir, hevwateyên naverokê hene û tê de riyên çareseriyê pir in.

-Di berhemên folklorî de, mixabin şer, lêkdan û kuştin jî hene.

-Di berhemên folklorî de, texlît û awayên eynî çîrokê, di piraniya zaravayê kurdî de hene.

-Di berhemên folklorî de, di piraniya çîrokan de sitranên folklorî û sitranbêj hene.

-Di berhemên folklorî de, ji yekê zêdetir şaxên çîrokekê hene.

-Di berhemên folklorî de, tewr û terzên jiyana neteweyî, bi awayekî pir xurt cih girtine

-Di berhemên folklorî de, rewşa jiyana çînayetî, perwerdekirina mirovan, xasma jî ya zarûkan tê de xweş hatine xuyakirin

-Di berhemên folklorî de, astengiyeke mezin jî li pêşberê dek û dolabên sextekaran heye.

-Di berhemên folklorî de, dek, dolab, xapandin û şilqatî jî pir hene.

Îcar ji ber ku ev tiştên hatin gotin tev di berhemên Folklora Kurdî de hene, dema mirov dikeve navê û dixwîne, pirî ku xweş in, mirov nikare dev jê berde.

Piraniya berhemên Folklorî, ji yekê zêdetir şax û çiqên wan hene. Wek nînak: Heft şaxên çîrokê GUL û SÎNEM hene. Şeş-heft çîrokên cuda di nava çîroka Hevberdana Qijik û Kevokê de, hene ku babeta her yekê cuda ye.

Berdewamî di hejmara bê de ye...

Berhemên Nû

SIRÛDÊN LÎSTOKAN JI FOLKLORÊ ZAROKAN
Bi 94 Sirûdên Rengereng Barkirî ye

Di vê meha Kanûnê de, bi navê "Sirûdên Lîstokan ji Folklorê Zarokan" Weşanxaneya DARê pirtûkek weşand, ku ya lêkolînerê Kurd Salihê Heydo ye.

Di vê berhemê de nivîskar Salihê Heydo 94 sirûdên zarokan bi naverokên xwe yên têvel ve, di pirtûkê de bi cih kirine.

Her 94 sirûdên di pirtûkê de, wekî ku ji devan hatine girtin, li pirtûkê hatine rêzkirin. Lê tişta herî xweş û balkêş ew e ku Salihê Heydo li jora her sirûdekê, şîroveyeke zengîn û bi rêk û pêk nivîsiye, her wiha cihê ku sirûd lê dihat gotin û êla ku tê de sirûd li kar bû, bi hûrgilî nivîsiye.

Sitêrname 7

Narîn Omer

Sûska Simo, di sala 1925'ê de di nava malbatekê de ku ji hêla rewiştên xwe ve sînorasê û nerînênteng bû, hatiye dinê.

Ew ji Kurdên Qefqasyayê ye.

Dema Sûskê nas kir ku ew xwediya wî dengê bicoş û zelal e, biryar da ku bi merdî û lehengî wan sînoran biherifîne, yan jî xwe di ser wan re biqevêze.

Wê nedixwest ku dengê wê tenê di giyanê wê de veşartî bimîne; tevlî ku dizanîbû dê rastî tîr û nîrên civaka xwe were jî, lê biryar stand ku divê gelê wê bi xweşiya dengê wê şad bibe.

Di destpêka jiyana xwe ya hunerî de, xurtekî Ermenî nas dike. Hêdî hêdî evîna bêçare cihê xwe di her dû dilan de asê dike, piştre bi wî re şû dike.(Dizewice)

Lê bi vê zewacê, êrîş û gotegotên civaka wê hêj zêdetir dibin; ji ber ku hevjînê wê ne ji ol û neteweya wê ye.

Êdî jiyana wê ya malbatî û civakî zor û ne xweş dibe, lê ew hunera xwe berdewam dike, ji ber ku baweriya wê hem bi deng û hem jî bi çanda gelê wê pir mezin bû.

Jiyana Wê ya Hunerî:

Sûska Simo hunermenda Kurd a yekemîn e ku di sala 1946'ê de li Sovyetê, li ser dika Şanoya "Flarmonya" rawestiyaye û bi zimanê Kurdî sitran gotine.

Ev şano ji gelên bindest re hatibû terxandin, da ku folklor, huner û çanda xwe li serê pêşkêş bikin; ji ber ku beriya 46'ê, Hikûmeta Navendî ev kar li wan qedexe kiribû.

Di wan aheng û şanoyan de, tevahiya neteweyên Sovyetê made dibûn, da ku çand û hunera hev binasin.

Hevjînê wê yê Ermenî Kolya Neftalya pê re alîkar bû, li hemî ahengên wê amade dibû, û carinan pê re derdiket li ser dikê û distirand…heta ku bibûn du hevalên ciyawaz.

Ne tenê li Êrîvanê nav û dengê wê belav bibû, lê belê li hemî komarên Sovyeta berê. Ji ber vê yekê dezgeh û saziyên van komaran ew vexwendî aheng û şahiyên xwe dikir.

Ev vedeng giha asta herî bilind, dema ku di 65'ê de hunermenda me li Hola Sor aheng li dar xist; ji ber ku ew hol ji hunermend û sazvanên mezin re hatibû terxandin.

Dibêjin ji ber navdariya wê û dengê wê yî xweş û bicoş, hezkerên wê hewl dida ku ji beriya ahengê bi çend rojan, kertê bibirin; û eger cih nemaba, wan di eywana ku bi dikê ve girêdayî bû tenê li dengê wê guhdar dikir.

Sitranên Wê yên Herî Navdar:

Ji destpêka karê xwe yê hunerî û hetanî bi dawiyê, hunermenda me biryar dabû ku ew folklor û çanda Kurdî wekî jêder û çavkanî bibîne, lewra her timî sitranên gelêrî û folklorî distirandin û ew zindî dikirin.

Sitrana herî girîng di jiyana wê

Sûska Simo...Balyoza Hunera Kurdî

ya hunerî de "Miho Wî Wî" ye. Ev sitrana, jê re bûye kilît û pencereya vedengiyê.

Piştre çend sitranên din, hêlana ku hezkirina dengê wê di dil û cînav de bêne çandin, mina:

Devera Berê, Lênîn Rabû û Belengaz Nû…

Kesên ku Bandora Xwe li Hunera Wê Kirine:

Bandora gelek kesan li ser wê heye, lê ya hinan ciyawaz e, mîna hevjînê wê yê Ermenî ku ji hemî aliyan ve pê re dilsoz, comerd û alîkar bû; lê ji aliyê civakî ve bandora wî li serê ne baş bû.

Kesê duyan "Egîdê Cimo" ye, Mîrê Bilûra kurdî di wê demê de; lewra di Radyaya Êrîvanê de berî ku sitranên wê biweşînin, digotin:

"Disitre Sûska Simo, lêdixe Egîdê Cimo".

Dawiya Wê:

Di sala 1977'ê de hunermenda me diçe li ser dilovaniya Xwedê, û di dîroka huner û çanda Kurdî de, dengê wê navnîşana zindîbûna wê dimîne.

Kurdî Xweş e

Bi dest xistin استحقاق	Firoşyar بائع	Gotar مقال.خطاب	Lêveger مرجعية
Payebilind ذو رتبة عالية	Xapînok مخادع	Roman رواية	Çavkanî مصدر
Rûdêm ملامح	Zargotin ادب شفاهي	Kurteçîrok قصة قصيرة	Rûpel صفحة
Rûpoş قِناع	Hinartin ارسال	Belav منتشر	Malper موقع
Sîwan مظلة	Radest kirin تسليم	Xerîk bûn انشغال	Hevpeyvîn حوار

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2						■		■	
3				■	■	■			
4						■	■		■
5		■			■		■		
6				■					
7	■		■				■		
8			■			■		■	
9						■			

Sitûnî

1- Dîlana çend kesan bi hev re – Bi lez

2- Keça ku li Kobanê xwe feda kir û bû sîmbol – Destvekirî

3- Merwan belavkirî

4-Du tîpên wekhev – Cînavkeke pirjimar

5-Du tîpên wekhev – Serbest (Vajî)

6- Çax

7- Amûra ku mirov masiyan pê digire (Vajî) – Du tîpên wekhev

8- Biol. Dîndar

9- Şûna lingên mirov – Oldar belavkirî

ASOYÎ

1- Koma çêlekan – Yek ji rengên girtî

2- Dehil (Mêşe) bi Tirkî

3- Îrade bi Kurdî – Lastîka giro-ver a ku zarok pê dilîzin

4- Navekî mêran ê Erebî

5- Cînavkeke pirjimar (Vajî) – Dijwateya Sitand

6-Dad belavkirî – Dader belavkirî

7- Ap bi devoka Cizîra Botan – Ard (Vajî)

8- Cînavka kesê axêver (Vajî) – Heman cînavk

9- Malbateke Misilman ku hukim li Şamê dikir- Mewc bi Kurdî

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

Qutî – Tazî – Şîret – Bizin – Kor – Peyman – Çekdar – Roj – Dadgeh – Por – Cihê – Meraq – Dûr – Çalak – Qencî – Ked – Haybûn – Berx – Merd – Şivan.

Peyva Windayî ji 11 tîpan pêk tê, ew jî navê avaker û serokê Komara Kurdistan (Mehabad) e.

p	e	y	m	a	n	d	k	o	r
t	a	z	î	e	b	i	z	i	n
r	o	j	m	d	a	d	g	e	h
q	e	n	c	î	q	e	d	û	r
ç	a	l	a	k	a	b	e	r	x
h	a	y	b	û	n	d	k	e	d
ş	i	v	a	n	h	m	e	r	d
m	e	r	a	q	i	c	i	h	ê
ç	e	k	d	a	r	m	p	o	r
ş	î	r	e	t	î	q	u	t	î

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	t	a	w	a	n	k	a	r	î
2	a	l	■	n	e	k	■	ê	r
3	t	a	r	î	■	■	r	w	a
4	î	v	■	k	a	r	■	e	d
5	n	■	a	■	r	a	b	n	e
6	■	n	n	a	■	m	e	d	■
7	r	î	■	r	r	■	r	a	k
8	e	h	ş	■	e	r	ê	■	e
9	ş	a	ş	■	h	o	z	a	n